Dumahîk : Jina Kurd ....

Gulistan perwer , Besê , ŞerÎbana kurdî, Fatê û h.w.d . Lê zor mixabin, li perçê sûriya me ya Sêrîn û biha , navên jinên dengbêj di dîroka hunerî ya nêzîk de nînin !.

Belkî , bi ya min be û xuyaye ku , kurdên me li vê şûriyê , di vê warî de, bêtirî deverine dî, bi şûnketîne û li şûnin . Ew gerdîşên civakÎ yên pûç , kufikî û vala, li ser hiş û ramanê me roj nedîtan (Kurdên Sûriyê) pal vedane Nêrînek çewit û nizim , li jina hunermend dimeyzînin , loman jî , keç û jinên xwe ji jiyana stran û stranbêjan bi dûr dixin .Bêguman ev yeka, encama nezanî û nasnekirina nirxê hunerane .

Belê û tenê, li ev çend salên dawîn , tek- tûk keçên ciwan , di riya komikên reqis û seman de, di riya hin partiyan re, ew dîsan dibêjim tek -tûk têne dîtin. Mixabin û pir - pir mixabin şêweyên têkiliyan bi wan re ne , ne bi kêrhatî û li gora daxwez û demê ne, pir pirgirêk û serêşên gelekî dijwar, ji hêla malbat û civakê ve , ew dengên nûgiha dibînin .

Zor - zor girînge ku basikên tevgera me ya siyasî , nirxê huner û hunermendan nemaze jin û keçên hunermend(stranbêj) di nava civakê de li wan xwedÎ . Pir pêwîste ku , em di vir de bi bîr bîninû xuyan bikin ku, huner bingeha dîrok, ziman û çanda miletan e . li dawÎ serkefitin û duhatiyeke xweş û geş , ji keç û jinên hunermend re li seranserÎ çar perçeyên Kurdistan , pêşketin û bi destxistina mafên hunerî , ji jina kurd li Sûriyê re hêvîdikin.

Yekîtiya Avokatên Kurd

Avokat û mavkarên Kurd, li Sûriyê , ji zû û mêj ve li xwe miqyat û şiyar in , pircivîn û civat, li pir dever û navçan digerandin. Weke encam, bi navîna sibata 2006 an re, me pirojeya rêbaza wan dît. Ew piroje, bi nav û îmza komîta hevdemî ya kongira damezrandina yekîtiya mafkarên Kurd li Sûriyê,

Xal û movirkên rêbazê yên bigehîn Ev bûn:

- Navê rêkxirawê: Yekîtiya Mavkarên Kurd li Sûriyê.
- Navend û şaxên wê: Bajarê Helebê weke navend, hemû parêzgehên dî yên Kurd lê têne dîtin, cîgehê şaxan e.

Armanc:

- kar ji bo kesayetiya mirovê Kurd, di riya komele û dezgehan re were pejirandin.
- Bervedan ji ber mafên mirovê Kurd, azadiyên bingehîn û gîştî li Sûriyê.
- Hawldan bona rêdaneke şaristanî û demokratîk dûrî nijadperestî, li gora belgeyên cîhanî û mafên mirovan...
- Kar ji bo zimanê Kurd weke zimanekî fermî li gel zimanê Erebî were pejirandin. ....
- Yekitî tê pişaftin bi biryara 2/3 ji endamên ku, li kongir beşdar dibin .

Em ji hêla xwe ve, dema ku, bi ragihandina vê yekîtiyê şah û pê serbilind in, serkewtin ji armanc û doza wan re hêvî dikin. Liben û hêviya pir dezgehên komelgehên şaristanî weke Endezyar, Nivîskar...Stranbêj î mozîkan û H.W.D.